


Hejmar (8)

1 - Sibat - 2014

Çandî - Giştî - Serbixwe - Nîvmehane ye



welat.press@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya





Li paş her şoreşekê xewndevan hene

Tevî hemî qelenê buha ta niha ku li serasnerî Sûriyê û Rojava ku vî gelî di riya Azadiyê de daniye, lê ev qelenê ku ji xwîneke pîroz bû berhemên xwe dide, tevî ku ev berhem bi xwe jî carinan bi xwînê sor dibe lê hêviya hemûyan ew e ku ev berhem êdî bêñ û bê xwîn.


Şoreşa Sûrî ku xewna piraniya gelê vî welatî bû ne jixweber bû lê li ser dirêjahiya gelek salan ew di dil û mejiyê azadîhezan de dihate meyandin ta ku ew roj hat ku ew hezkirin xwest bibe rastî û li Şamê di 15-3-2011an de azadiyê gava xwe ya pêşî avêt. Şoreşek wek ya Sûrî di welitekî ku li jêr desthiladariyeke totalîrîte wek ya Beşar El-Esed tiştekî ne hêsan bû lê gelek viyan jêre divabû , hevdem bo berdewamiya wê viyan û berxwedaniyeke mezintir divê, belkî ku aniha hin alî hewl didin ku rûyê vê şoreşê biguherin û navên Islamî an tundrew bidin wê lê wek ev şoreş ya be

lengazan bû ew dê li wan vegere.

Ev şoreşa ne pêkan ku dest pê kir di nav rewşeke ji dektatoriyê , pêkane ku berdewam bike dema ku em nas bikin ya herî zehmet tê de ku dest pê bike. Li paş vê şoreşê xewnevânê azadiyê hebûn û ew hîn li ser wê riyê ne, çi ku ew bi navê xwe bin ji ber ew aniha ne li nav mene û pakrewan in û çi jî ku ew hîn sax in û di nav me de ne, xewnevanê azadiyê li Sûriyê û Rojava hiştin ku em nas bkin welatên mezin di hundirê me de xewnên mezin bo wan gerek in .

Wek ev şoreş xewna hinek xewndevan bû ku wê vêxin û aniha li dar e , xewnên biçük yên me jî wê av didin , Kovara Welat jî yek ji van xewna ye..hûn bi xewndinê û nivîsandinê û em bi amadekirin û westandinê em dikarin wê av bidin, bela em herdem nêzîkî hev bin.

Aras Yûsiv 





Cîhana Facebookê

Piştî pêşketina mezin di warê têkeliyan de û bitaybetî jî di cîhana ïnternêtê de, êdî cûrên nû ji şêwazên têkaliyan re hate holê.weke Yahoo! Messenger, Skype, Twitter û Facebook hwd..

Dema ku Mark Zugerberg bernameya Facebook pêkanî li ser ïnternêtê ew û cîhaneke nû afirand ji gelek nifşan re, û bi lez ev bû cîhana hevdem ji gelek xelkên ku ïnternêt ji wan re girîng e.

Di destpêka xwe de Facebook şûna demên valahiyê digirt, û ew hestên bêzar ji nik mirovan dûr dixist.

Lê pêre dibû tişteke pêwîst ku pêdiviyên sereke yên têkeliyan bi wê diqedin, ji wê êdî nema ew cîhana ku mirov bi tiştin vala mijûl dike, berovajî wê hin bi hin Facebook dibû cihê ku glek kar û xebatên girîng di wê de bikar dihê, ta giha asteya ku şoreşeke mezin xiste bîr û baweriya mirovan de û hemû şoreşen Buhara Gelan ên ku di van çend salên dawî de li dar ketin nimûneyin jîwarî ne li ser giringiya rola Facebookê di wan de ku çawa ciwanên şoreşger agahiyên xwe di rêya wê de belav dikirin û bi wê her kes agahî û nûçeyên wan şoreşan dibihîstin. û weku aniha em dibînin ku Facebook cihê belavkirina nûçeyan e, û gelek siyasetmedar an jî partiyên siyasî daxuyaniyên xwe li ser rûpelên wê digihînin raya giştî û ew jî têtin şopandin û bi rêjeyeke biblind. Tevî ku gelek bûyer di dema me ya aniha de têtin belgekirin di rêya Facebookê.



Ji wê em gelek caran li wê dierin bi şêweyeke erênî û pêwîst, ev ji aliyekî ve, lê ji aliyekî din ve gelek tiştên neyinî ji wê re hene dibe ku mirov bitevahî ji wan xwe dûr bixe, ew demên ku dibe qada şer û pevcûnên devokî şûna ku bibe cihê giftûgoyê da mirov bigihê encamin erênî bikevin xizmeta ramanên ku jiyanê li pêş bibin li ser hemû asteyan. jibilî ku carnâ dibe cihê gelek tiştên ku zîyanê li baweriyan dike û bitaybetî jî yên ku hêj di temenê sîpeyê de ne.

Mirov çendî bikaribe pêşketinên têknolojî bi dest bixe û sûdeyan ji wan bigire, ewqasî dikare ku jiyanê li pêş ve bibe weku erkê wî ji wî tête xwestin.

Perwîn Ismaîl



Dilê welatê min

Jin dijî jinê ye

Gelo ma jin bi xwe jinê dipijirîne? Gelo ma jin raman û hastên xwe li ser sitûnên lêbûrînê û hevjiyanê bi jinê re ava dike? Ma jin ji tirskariyê dermafê jinê de nake?

Her sal jin û bi hezaran roja tûndî û zordariyê dijî jinan li bîr tînin, û civakê û mîr bi hevre şermezar dikan, û wan dibînin weko tûndrew û tawanbar di aliyê jinan de, lê ma jin bixwe nabe tawanbar dema zordariyê û tûndiyê li ser jinê bi xurtahî pêktîne?

Belî dema "xwesû" bi awayeke dijwar û zor danûsitandinê bi "bûkê" re dike, ev nabe zordarî? Dema "jintî" çavresiyê dide jintiyê, û dixwaze jiyana wê nexweş bike, ma ev nabe celebek ji celebêñ tûndî û zordariyê? Gava cîran çavtangiyê bide cîrana xwe, û wê ji xwe bextiyar tir bibîne, û hewil bide mala wê xirab bike, ev nabe awayek zor ji awayêñ zordariyê? Dema jin di malbatê de û dervê malbatê, di civakê de, di hemî warê karan de, di rêexistinêñ civakî û konevanî û ramyarî de.

dijî jinê ne raweste, tu caran jin nakeve û blindest namîne. Mixabin bihtirîn jin ji jinan hez nakin û xêrê ji wan naxwazin, vêca wê çawa civak û nemaze mîr ji wan re pişt û hevkar bin.

Eger jin bixwaze serkeftin bibe nîşana dozawê pêwîste ew bi xwe re rast û durist be, û ew ji xwe bixwe dest pê bike, û hiş û ramanêñ xwe, dilê xwe ji dijayetiya jinê bişû, û wan baş ji şopêñ wan jî paqij bike, û tovêñ hezkirinê û evîniyê û dilpakiyê ji şûna wan di aliyê jinê de belav bike û di xaka dilsoziyê de biçîne, da ew bikaribe bi awayek rast û li ser xaka resen dest bi karê xwe bike, û doza xwe ji civakan re û ji



gelan re diyar bike, û armancêñ xwe eşkere bike. Bi vî hawî ez bi bawerim wê jin ser bikeve û xwe bide nasîn weko jîndareka serbixwe û xwedî helwest û mebest, û wê mîr bi rêzdarî wê qebûl bike weko hevkar, weko hevalciêwiya jiyana wî di hemî dergeh û bergehêñ jiyanê de.

Helbet ne civak bitena xwe, û ne mîr bitena xwe dibin sedemêñ tarîbûna rewşa jinê, tevî kû ew gelek caran dibin kelemêñ asê di riya wê de, lê jin jî sedema herî zor e di rêya jinê de eger ev kelemêñ dijwar rabin wê jin bi hesanî rêk û pêkêñ jiyana giştî dê bidomîne weku dayîk, weku keç, weku hevjîn, û weku hevkara jiyana mîr.

Narîn Omer



Aştîya Navxweyî



Aştîya Navxweyî tê wateya ku mirov jiyanâ xwe bijî , û xebatên xwe bi awayekî azad û berpirsyar bik e , maf û pêdivahiyêni jiyana xwe bi xweşî û hêsanî bidest bixîn e, bê ku bitirs e ji destdirêjiya li maf yan mal yan ewlehiya wî kesan e yan ya malbatê.

Aştîya navxweyî dixebeit e bo qedexekirina hemû şêweyêni hevrikî û pevcûnê (şerê navxweyî) , ew dijîtiya çanda kînê dik e . hebûna aştiya navxweyî di civakê de nîşana saxlemî û durustbûna wê ye , dide xuyakirin ku ev civak dikar e pêşve her e û geşpêdanê pêk bîn e berovajî civakên jihevetî û tijî gir û kîn .

Aştîya navxweyî liser hîmin sereke av dib e , hîm in ku civakê bi rêkûpêk dik e, rê liber neyartiya jiber al, ol û ziman digir e, ew rûdêm û pîvan in çak in bo ku civak liservxe be. Aştîya navxweyî dengê wijdan û zanebûn perjirandinê ye jiwiyo divab e biryar yan destpêşkirî ji destê nezan û tundrewan derkeve û têkeve desdtê mirovên pispor û xwedî agahî .

Hîm û ragîrên Aştîya Navxweyî :

1- xurtkirin û rêzgirtina firewanî ya civakê :

Bêguman li hemû welatan netew , ol , rîbaz , têvilî peyda dib e , û ev yek tîye bikaranîn bo hilweşandina civakê . îca her ku pîvanêni hevpejirandinê û sedemên pêkhatina pêkvejiyanê peyda bib in hîmek sereke ji hîmîn Aştîya Navxweyî ava dib e, û berovajî wê hevrikî û wîraniya civak û aştiyê ye .

2- Serpereştiya Yasayê :

Dema ku yasa serpereştiya civakê bik e û mafê herkesî bibîn e, û jihêla dezgehêne ewlekariyê ve were parastin bê ku beşek liser yê din wer e girt in wê çaxê pîvanêni aşti û aramiya civakê wê lidar be .

3- Fermanrewayetiya Çak :

Bêguma jibo ku em aştiya civakê biparêz in divab e Fermanrewayetiye Çak hebe wê qezenc bik e... divab e Zelalmendî û Lépirsînek heb e bo hemû beşen dewlet û civakê (rêvebirî , aborî... h.w.d) zelal be ji gel re .

4- azadiya derbirînê :

Dema em dibêj in Aştîya Navxweyî aramî û pejirandina pêkhateyêni civakê ji hevdû re ne bmguman azadiya derbirînê vê yekê radigir e û nebûna wê astengiyekê lê peyda dik e.

5- Dadmendiya civakê :

Civak , dewlet û rêvebiriya wê ne milkê bireyekê bi tena serê xwe ye lê mafê herkesî ye ku lê beşdar bib e û rengê xwe lê vede .

6- hebûna ragihandieke azad û hevseng :

Bo ku dengê herkesî di welat de wer e guhdarkirin divab e ragihandinek azad û hevseng heb e da ku welatî bikarib in deng , êş , derbirîna xwe ronî bik in 7- Dadmendiya veguhezyan e .

8- rîlibergirtina kîn û neyaritiya (netew – ol – rîbaz.. h.w.d) an

Jiber ku hîm in hene bo xurtkirin û pêşdebirina civakê ber bi aşti û aramîyê ve , wê gelek kiryar û alavêne hevrikiyê ji heb in û hin jê ev in :

Alavêne hevrikiya navxweyî :

- dûrkirina yê din ê hevparê civakî yan yê siyasî li welat - tolvekirina siyasî .

- tolvekirina rîbazî .

- hevrikiya netewyên rengareng ê pêkhateya suryayê : kurd – ermen – çerkez – erek – asûrî – suryan .

- nedîyarbûna bikaranînê demokrasyan e .

- kêmnasîna agahiyan derbarê bawerî û rewşa kêmârên civakê .

- destlîwerdana navdewletî û encamên wê .

- hevrikiya çîn û aboriyê .

bo bicîanîna Aştîya Navxweyî pêdivahiyek heye bi perwerdeya çalakvanan bi armanca rastkirina nêrîn û bergrhêne wan da ku xurtbûn û hêza bandora wan di warê hişmendiyê de bib e alîkar di warê pêşdebirina têgeha aştiya navxweyî , jîbilî wê divab e hemû alavêne ragihandinê û toreyêni hevgihandina civakî têkeve bin xizmeta belavkirina bîrewerî û hişmendiyê tevî rengarengî çalakiyêni civakê , rûspî , xwedanbiryar , lê barê giran tîye ser milê rîexistinê civaka sivil û desteyêni ragihandinê bo pêşdebirina hişyarkirina vê qonaxê .bêguman bo rewşa welatekî mîna suryayê ku di bin metirsiyêni perçebûn û şerê navxweyî de dimîn e belavkirina agahiyan derbarê aşti û aramîyê de pêdivahî û pêwistiyek e .

Zuhrab Qado

<http://ccsdssyria.org/arabic/category/library>



Derd û derman

Wek tê gotin ku (ji her derdekî re dermanek heye) lê îro li rojavayê kurdistanê, derd pirbûne, lê derman , peyda nabin. Kêmbûna derman, îro pirsgirêkeke mezin ji hemwelatiyên rojava re durist kirye, û pêwîstî bi çareseriyeke lezgîn heye. herweha gelek cûreyên derman dakteine bazaran ku jêderên wan ne diyare, û ziyana wan ji sûda wan bêhtire , û gelek kesan berê xwe dane çareseriya sirûstî bi riya dermanên ku ji pincarên bijîşkî durist dikan.

Tevî ku hin komeleyên serbixwe yên hawarhatinê hewl didin ku derman ji xelkê re peyda bikin, lê ew jî nikarin ku sercем pêdivyên wan romal bikin.

Li gorî lêgerîna ku me li hin dermanxaneyên bajrê Amûdê kir, piraniya xwedyên van dermanxaneyan egera kêm-bûna derman vedgerandin van sedeman:

- 1- girtina piraniya kargehên derman, ji ber berdewambûna şer li Sûryê.
- 2- girtina rûyên sereke di navbera herêmên kurdî û navçeyên din yên Sûryê.
- 3- girtina deriyên sînorî.

Xwedî nexweşyên dirêjxayen wek (şerpence..şekir..û hin nexweşyên din) rewşa wan ber bi xerabûnê ve diçe ji ber



nebûna derman yan jî buhabûna nirxê wî, ku kesên hejar nikarin bikirin û çareseriya xwe berdewam bikin.

Bavê Ciwan mirovek temen 80 salî ye tûşî nexweşiya şekrê bûye , û pêwîstya wî ya berdewam bi derzyên ênsolînê heye, ku ew jî peyda nabin , lewra metirsî li ser iyana wî heye, û gelek nexweşen din weke wî hena, û ew jî li hêviya komîteyên hawarhatinê ne , ku karibin derman ji wan re peyda bikin û jiyana wan rizgar bikin.

Mihemet Alûcî



Dibistan û zivistan

Hisêñ Reşik

Zivistana ku ïsal li ser bajarê Hesekê hat ne wek ti zivistanê bû,û berfa ku ïsal bariya,wek wê ji sed salî û vir de nebariye û digel kembûna sute meniyê û bilindbûna buhayan rewşa jiyanê li vî bajarî ket keshyeke mezin de.

Vê salê rêveberiya perwerdehiyê mazot li dibistanan dabeş nekir,loma zarokên dibistanan gelek astengî dîtin,gelek ji wan ji dibistanê qut bûn,gelek nexweş ketin û bi tevayî fêrkirinek çak û durist werne girtin. Ji bo vê keshye,gelek mamosteyan xwest çareyekê bibînin,jibo wilo peywendî bi xwedanê zarokan kirin,û li wan pêşinyar kirin ku her rojê şagirtek haceta pola xwe(sefa xwe) ji mazotê bîne,û ji ber ku her polek (40)şagirt têde heye,dê her şagirtek her cil rojî (2,5)L mazot jê bê xwestin,û bi vî şêweyî keshyea germkirinê li gelek dibistanan çareser bû.

Di vê çarçoveyê de mamoste Rojîn Haco ji dibistana (Ehmed Mixlif) ji "Welat" re wiha axivî:bi rastî ev zivistan pir sar bû,şagirt di waneyên xwe de ne çalak bûn,gelek ji wan nexweş diketin,û ji dewamê qut dibûn,lê ev bîroka me li xwedanê zarokan pêşinyar kir cihê razîbûn û dilxweşîya wan bû,û zû bi zû pişta me girtin û alîkariya me kirin.

Hozan Ebdella,şagirtek ji heman dibistanê ji me re wilo got: ïsal gelek pêwîstiyêñ fêrkirinê ji me kêm bûn,lê tiştê herî zehmet ev serma dijwar bû,lê pişti ku em mazotê ji malêñ xwe tînin êdî nema bi sermayê dihisin,û baş em guh didin waneyên xwe. Li dawiyê,em dixwazin ev ezmûna baş ya ku li hinek dibistanan giha serî bibe nimûneyek ji hemû dibistanan re.da ku zarokên me dûrî êş û nexweşîyan bin,û xwendina wan bi rêk û pêk be.





Kêmaniya derman li Girkê Legê



Roj bi roj rewşa rojane di herêma GIRKÊ LEGÊ zehmet dibe û kêmanî dikeve gelek pêdviyên jîyanê yên sereke lê ya herî zehmet û giring ew e dema nexweş bê derman dimînin bi teybatî nexweşiyên êşen giran wek êşa şekir û êşa dil û eşa pençeşêr nexweşen van êşan bê çare mane û rewşeka zehmet dibûrînin dema ku derman namînt li dermanxaneyan.

herwiha nexweşkî êşa şekir UMER MIHAMED kulê xwe ji kovara Welat re got: dema dermanê min namîne ez li hemî bajarên parizgeha HESKÊ digerim ta ez dermanê xwe peyda dikim û gelek caran jî peydanakim, herwiha UMER di berdewamiya axfitna xwe de got ev bihtir ji deh salan nexweşî bi

min re domdike lê ti salan min wek van herdu salên bihurî nedîye.

herwiha dermansaz ABDÊ QASIM wisa axift:ev du sal li ser pirsgirêka kêmaniya derman ve derbas bûne hêj ti alîkariyên bijîşkî ji herêmê re nehatine û dermanxaneyên bajêr vala bûne ji dermanan û dema derman ji me re tê bi buheyike gelek giran e ji ber ew derman ji bazara reş ve tê.

sedamên qûtbûna derman pir in , sedma serke ew e ku rîyênu ku dihêن herêmê bitevahî qutbûne û em dikarin bibêjin ku dorpêçkirinek li er wê heye.

În. nexweş di êşa xwede bê neçar dimînin û bi hêvîya çareseriyeke nedîyar

GULAL LIYANÎ



Rewşa internetê li Dêrikê



Piştî derbasbûna bêhtir ji salekê li ser qutkirina ûntrnêta (adsl) Welatiyên bajêr li alavin din digerîyan ji bo peydakrina ûnternêtê Nêzîkbûna sînorêن bakurê kurdistanê ji dêrikê ve çareyeke baş bû ji ve pirisgirêkê re bi rêya modimê turkî. Yen internete.

Wek modimên vodafone u turksel u avea

Lê ev modim pirsgirêkên wan pir in ,wek qelsbûna toreya wan buhabûna temenê kirîn û dagirtina wan dibin sedem ku gelek ji xelkêن Dêrikê nikarin wan bi destxin.


Ji ber vê xwdanêن (kafî nêt) ûnternêta asîmanî bikartînin û gelek ji wan li bajêr peyda bûne.

Bikaranîna wê gelek pirisgirêk çareser bûne, bitaybetî jî ji bo xwendekaran ên ku xwendina xwe di rêya ûnternêtê de dişopînin.

Lê ew jî gelek aloziyêن xwe hene, wek buhabûna wê, û qutbûna kehrebeyê, ji ber ku ew li ser kehrebeyê bikar dihê, û dema ku ew qut dibe xwedanê (kafî nêtê) neçar dibe ku peydakerê kehrebeyê(dînemo) vexîne û ew jî dibe sedem ku nirxê wê bilind bike.

Lê dimîne ku Nêt heneşte be di bajêr de çêtir e ku ew pêwar be ji ber ku ew aniha alava her girîng e ji têkeliyan re di cîhanê de.

Fener Ehmed





Dergehê sînor ê Dirbêsiyê

Sadûn El Sîno

Ji beriya cejna qurbanê ya bihurî dergehê sînor di navbera Dirbêsiyê û Tirkîyê de hatibû vekirin ji bo çûn û hatinê li bi mercê ku nifûsa Tirkî hebe bi kesê ku ew ê derbas bibe, û milet pir alozî ditîtin dema ku digihan sînor û gelek caran jî demên dirêj dibihurandin ta ku rê li pêş wan vedikirin.

Li di dawiya heyva 10an de ya sala çûyî, rê bi şêweyeke firehtir vebibû û bi taybetî jî li pêş nexweşan da bikaribin biçin xwe li nexweşxaneyên Tirkîyê derman bikin.

Birêz Mihemed Reşîd wisa rewş ji me re şîrovekir:dema ku kesek bixwaze ji Tirkîyê vegere dibe ku navê xwe li aliyê Tirkî tomor bike û li wir jî pençemora wî distînin, û li aliyê me peryan bide hêza ku parastina sînor dike ya girêdayî asayîşê weke gumrika derbasbûyînê.

Herwiha ev ji bo rewşin taybet wisa dibe, lê kesê ku nikaribe derbas bibe ji aliyê Dirbêsiyê û ber bi Tirkîyê ve neçar dibe ku li rûyên din bigere da sînor bibihure, ew rê rûyên qaçax in, lê pir dijwarî û alozî bi wan re derbas dabin ta ku bigihêن aliyê din ji sînor ew jî eger derbas bibin, û gelek caran jî leşkerên Tirk yêن li ser sînor wan digirin û wan diêşînin bi lêdan û işkenceyê, û wisa jî wan vedigerînin û nedihêlin ku derbas bibin.

Weku tête zanîn ku ew kesênu ku dixwazin derbikewin Tirkîyê li kar ji rewşa aloz a ku herêm bitevahî di wê de dibihure, bitaybetî jî rewşa aborî , jibilî ew rewşen weke nexweşyan ên ku li vir dermankirin ji wan re tune ye. û ev diyarde dibe ku çareseriyej ji wê re bête danîn da herêm ji xelkêن xwe vala nemîne.





Navenda Biratî ya civaka sivîl

Di gavek nû û balkêş de di civaka Serê kaniyê de ya ku bi pêkhatiyên xwe yên hevjin navdar e, navenda (Biratî) bo dîmokrasiyê û civaka sivîl serotar bû û dergehêne wê hate vekirin di 20-11-2013 .z .ev serotar bi amadebûna hejmareke xwiya ji partian û kesayetiyên civakî û rêzanî hatibû destpêkirn ji hemî pêkhatiyên bajêr , ew kesên ku amadebûn li vê navendê diyar kirin xweşiya wan û bidilbûna wan ji vê gava pîroz, û tekez kirin ku weke van kar û barêن biratiyê ewê pêtir hevjiyana hevbeş bi hêz bike .

Nivîsgeha (Biratî) li Serê kaniyê ew navenda sêyemîne li bajarên Kurdî, ji piştî Qamişlo û Hesekê, û diyare ku damezrandina van navandan di çi devereck rengîn bi pêkhatiyan armanc ji wê ewe gihiştina civakek sivîl û aram , û çespandina biratiyê di van rewşen aloz ya ku Sûrî bi tevayî û herêma me bi taybetî ji wê bi êş û xembare.

Ciwaniya vê navendê li bajarê Serê kaniyê ewe ku kesên bi barê wê radibin ji hemî pêkhatiyanin bi alîkarî û rêkbûyî, dûrî rîbaza li xwe girtinê û gefîn û cenga rû reş. Û di seredana (Welat) bo vê navendê ,û di axaftina me bi ciwanên (Biratî) re li

ser bicih anîn û karanîna armanc û dozêن vê navendê, bo me tekez kirin û çespandin ku hêviya wan civakek xwe rakir e , civakek sivîl û dîmokras , banga biratiyê û hêviya hevjiyaneke hevbeş bo bajarê Serê kaniyê û teva Sûryê aştiyê û hezkirinê, çanda mafê mirovan,bi awayên amoşî dixwazin û bo van daxwazan ew ê li karbin.

Xalid şêxo

Fraternity Center
For Democracy and Civil Society
مركز الشّقيق للديمقراطية والمجتمع المدني

حقوقك.. مو منيّة

Mafin te ne minetin

汝の権利は貴様の恩恵ではない

Your rights are not a privilege



Ragihandin li Rojavayê Kurdistanê

Ji destpêka şoreşa Sûrya ve pir tişt hatine guhertin ,û pir tiştên nû jî derketin. Herwiha jî ragihandin yek ji wan tiştên ku mirov dikare bibêje ku bi şêweyeke nû hate holê.

Ciwanên Kurd ên ku dikarîbûn her tiştên ku girêdayî şoreşê bûn belge bikin weke xwepêşandanîn û xebatênu ku dibûn, tevî alavênu xwe yên asan lê wan dikarîbûn ku her tiştî bigihînin hemû kenalênu ku rewşa welêt dişopandin.

Û pêre ragihandinêna başûrê Kurdistanê ketin hinava mala ragihandina Rojava de, û hin bi hin bi şêweyeke eşkere karê xwe diki-rin ,piştî ku ew veşartî bûn di destpêka xwe de.

Lê mirov dikare bibêje ku rengeke azad çêbûye li Rojava di warê ragihandinê de, û aniha jî Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA)li Qamişloyê heye weke saziyekê ku bi kar û barê xwe radibe.

Herwiha jî gelek ragihandin li Qamişloyê bikar dihênu bi hemû şêweyênu xwe weke : nûçegihanênu kenalênu asîmanî,rojname,kovar, malperênu ïntrnêtu herwiha jî radiyo û ajansênu nûçeyan.

Û bitavahî jî hemû hatine pejirandin ji hêla YRA ve bi rengeke fermî.

Endamê YRA birêz Cûdî Xelo ji me re li ser vê rewşê Axift:

Piştî ku hêza Kurdî çêbibû li Rojava me ev Yekîtiya damezirand ji bo karênu ragihandinê bitevahî û parastina rojnemavanî ,herwiha ev sazî bi biryarekê ji DBK bû.Xelo wisa berdewamkir: ci kesênu ku bixwazin di vê

mijarê de kar bike dibe ku pejirandina me bistînin û êdî em ê dê ji wan re piştgir bin, û ci alîkarî jî ji wan

re gerk bin em ê dê pêşkêş bikin.

Peyamnêrê Kurdistan T.V ji Welat re wisa axift: min dest bi karê ragihandinê kiribû bi bernameyeke taybet li ser rewşa siyasetmedar û nivîskaran ji hi kenalan re weke:Roj,Kurdsat û Kurd1.... û ev nêzî du salan ez bi Kurdistan T.V re kar dikim ,û di nerîna min de ragihandina Başûr girêda ye bi siyaseta xwe ve, û ji ber layanêni siyasi yên ku şerê hev dikin gelek astengî ji vî karî re çêdibin.

Û derbarê pêşeroja ragihandinê li Rojava Hindê wisa dibêje: hin kenal dibe ku bêtin damezirandin , û dema ku nakokiyêni siyasi ji navbera wan rabin,karê me di vî warî de dê pir pêşbikeve.

Ragihandin tişteke pir girîng e, dema ku bi zelalî û rastî bête bikaranîn ew ê dê millet û baweriyêni wî bi cîhanêbitevahî bide nasîn,tevî giringya wê di avakirina welatan de.

Xunav Kano





Ji gewherên Mem û Zînê : Xaniyê Mêjûnas

Seydayê Xanî di Mem û Zîna xwe de her cure zanîna xwe daye nîşandan. Ji tesewûfê bigire heta felsefeyê, heta ci-vaknasiyê û muzîkê, stêrnasî û zimanazniyê, û heta bigihê mêtjûnasiyê.

Wî ji her zanînê behrewerî biriye. Di zimanê erebî de desthilatdariyeke pir mezin daye xuyakirin. Peyvîn erebî yên ku tenê di ferhengan de hene û ereban bi xwe êdî ew ji bîr kiribûn, bi karanîne. Mînak peyva Yûh (H wek H'ya di serê gotina Heyran de ye) ji bo rojê bi kartîne. Lê mijara me ya îro ne zimanazniya Xanî ye, belê mêtjûnasîna wî ye.

De ka em binêrin heta kîjan radeyê Şêxê me mêtjûya kurdan dipa û di kitaba kurdan de hin beş ji vê mêtjûya ku hemî xwînrêjî û şer bû anîne ziman!

Dema ku Beko yê ewan tê ba mîr û paşgoyîya Tacdîn dike, li xweşa mîr nayê. Radibe piştgiriya Tacdîn û Memo dike. Wisa xanî çîrokê dibêje:

Mîr go: Qe didim eya bed exter Tacdîn û Memê bi textê Qeyser?

Roja we ku bûye ceng û perxaş Tacdîn û Memê du sed Qizilbaş

Bilcumle bi zirh û zend û binber

Înan ji me ra bi şîr û şesper Bê guman Xanî ne ji xwe re qafiye li hev anîne, lê di van malikan de behsa şerekî di navbera leşkerên



Cizîrê û leşkerên sefewiyan (Qizilbaşan) de dike. Xanî li ser zimanê mîr pesnê Tacdîn û Memê wiha dide:

Roja şer û cengê, Tacdîn û Memê du sed serbazên qizilbaşan dîl girtin û anîne Cizîrê. Hemû tev li çek û şûr û zirx û gurzên wan.

Ji ber ku Mem û Zîn ne her kitêb e diva bû ez li jêderên dîrokî vegerim û binêrim ka ev ci şer bû di navbera kurdan û eceman de qewimî bû.

Di Şerefnameyê de çavên min bi şerê di navbera Artêşa Şah Îsmeîlê sefewî û cengawerên Botanê di dema mîr Şeref de ketin. Şerefxan dibêje ku dema şah Îsmeîl hate ser textê Îranê, leşkerekî giran şande Cizîrê da ku dagir bike lê mîr Şerefê kurd li ber xwe da û çend caran ew leşker şikand heta di şerekî de hezar û heftsed qizilbaş kuştin û gelek ji wan dîl kirin. Dîsa Şah Îsmeîl leşkerek bi serokatiya mîrmîranê Diyarbekirê Mihemed İstaclû û birayê wî Qerexan re şand e Cizîra kurdan lî dîsa jî zora mîr Şeref nebirin û şikestî vegeriyan. Cara sêyem şah leşkerekî bijarte ji pasdaranê şahanî ji hêla Hemed-anê bi serokatiya Yekan begê Teklû kişande ber bi Cizîrê ve. Lê vê carê jî artêşa qizilbaşan şikesteke mezin xwarin û revî, revî berê xwe dane welatê Îranê û êdî nema qizilbaşan bela xwe di kurdên Cizîrê dan!

Ev e giraniya Mem û Zînê.

Ne tenê çîrokeke xemgîn a du evîndaran e!!


Ev e cudatiya Mem û Zînê ji berhemên din.

Ev in gewherên şêxê kurdayetiyê Ehmedê Xanî. Heta yeke din....

Jan Dost



Mele Nûrî Hesarı



Helbestvan Mele Nûrî Hesarı (Per îşan) Li gundê Hesarê yê ser bi herêma kircosê li bakurê Kurdistanê ji dayik bû di sala 1934an de Di çardehsalîya xwe de, berê xwe da rojava yê Kurdistanê û li gundê Til Merûf bi cîûwar bû jibo xwendina zanînên fiqhê Olî û paşre melatîya çend gundan kir wekû (Mehmûdîyê - Ceradîyê - Til Mistê - Litêfîyê...) Mele Nûrî rastî gelek fişaran hat ji alîyê şêxan ve jiber helwestên wî yê netewî û nivîsandina helbestê lewra hat dûrxistin ji melatî yê û demekê wî wekû cildirû kar kir jibo dabînkirina qûtê rojane . Paşre di sala 1967an de li bajarê Qamişlo bi cîûwar bû û nivîsandina helbestê berdewam kir tevlî fişarên ewlekarîya sûrî ya kû ew bê çar kir

ser sûndxwarinê bi Quranê da nevegere nivîsandina helbestê lê ew berdewam bû di xebat û helbestan de û gefê desthelatê paşguh kir û pelên xwe di bin erdê û di dîwaran de diveşart lewra gelek pelên wî têkdiçûn Mele Nûrî gelek piştgirî û alîkarî pêşkêşî penaberên başûrê Kurdistanê kir û mala wî bû penageh ji kesên sivil û pêşmergan re Mele bi çar ziman di. axivî (Kurdî - Erebî - Tirkî - Farisî) û çar pirtûkên wî yê çapkirî hene (Şoreşa Barzanî - Zevîyek Gazîdan - Axlîme - Rêziman) Di sala 1988an de bi nexweşîya Falic ket û ma rûniştî di mal de lewra berhemên wî yê ne çapkirî pirin û ji wan sedan helbest, Ferhenga Kurdî-Erebî, Ferhenga Kurdî-Tirkî, Ferhenga Kurmancî-Zazî û herweha mewlida pêxember bi zimanê kurdî. Çendîn xelat û rêzname wer-girtine (Xelata helbestvan Cegerxwîn a afrandina helbestê sala 2008an, bawer-nameya rêzgirtinê ji festîvala helbesta kurdî ya 12mîn li sûriya sala 2007an li Qamişlo, rêzname yek ji dîdargeha çand û hunerê û kovara Mewasim, û rêzname yek ji partiya Yekîtiya Demoqrat a Kurd li sûrî (Yekîti). Di 25ê meha Çile sala 2011an de li taxa Qenat Siwês li Qamişlo, Mele Nûrî çû dilovaniya xwedê piştî ku jiyana xwe derbaskir di xizmeta ziman û çanda kurdî de.

Qîza ciwan û gulperî
şewq û şemala xweserî
Ger tu dixwazî koçerî
mizgîn didim va bû buhar
Dakev ji wê asêgehê
adar giha roja nehê
Serbest were vê bergehê
bê tirs li ber çavê neyar



الطفل السوري ومن الحرب والعنافي

هلست يوسف



ال طفل الثائر، البطل، أو الضحية، الطفل الشاب، الطفل العجوز، الطفل المناضل، الطفل السجين ، الطفل المذبوح بالسلام الأبيض، وبالرصاصة، والبراميل المتفجرة، إنه وإن سلم من كل هذا، فإن جراحاته تنفتح في روحه، من داخلها، إنه طفل عاش الألم بكل أنواعه، طفل يسير نحو أميته، يشكل جيلاً من الأميين، في زمن الاختراعات العلمية الجبارية، إنه الطفل الذي لا يمكن له أن ييرا من آلامه وجراحه، بعيداً عن وطنه وصدر أبيويه، مع أنه للأسف مكره على أداء دور أكبر منه على منصة الثورة، نسب إليه الثورة، وكان مكرهاً عليها، نسب إليه النصر، وهو يتائب العنف، الذي فرض عليه، طفل يسير أمام أعيننا، منكسرأ، حزيناً، حافي القدمين، جائعاً، صبوراً، مقاتلاً، يواجه جلاديه بالحجارة والكلام البريء. طوبى لكم أطفالنا ..، فلو أن الحياة عادلة، لو كان العالم عادلاً، ما كنتم موزعين على العنافي وخيم ومعسكرات اللجوء، هكذا، ما كنتم محروميين من كل ماتحلمون به، ولو توافرت العدالة، فالوطن سيصبح لكم منصة فرج، فردوساً أرضياً، وسيكون لكم كامل الحرية في تمثيل أدواركم، كما تشهون، وإن يصبح الوطن حرّاً، ونصبح أحراراً، سنقف لكم جميعاً، كي تناولوا المكانة الائقة بكم، إننا ننتظر من يقف معكم، يساندكم، يعيدهم إلى طفولتكم، يعيد طفولتكم اليكـنـ، لتعودوا إلى حدائقكم .. العابكم .. طفولتكم .. منصتكم ..، هـاـ أـنـ اـنـصـورـ خـلـامـكمـ، أيـهاـ الأـطـافـالـ، طـوبـىـ لـكـمـ، طـوبـىـ لـحـرـيـتـكـمـ، طـوبـىـ لـفـرـدـكـمـ، وهـاـ إـنـيـ أـصـفـكـمـ، إـلـىـ أـنـ نـصـبـ أـحـرـارـاـ مـعـاـ، نـصـبـ أـحـرـارـاـ بـفـضـلـكـمـ، أيـهاـ الثـائـرـونـ أـيـنـماـ كـنـتـمـ ..، أيـهاـ المـنـفـيـونـ فـيـ كـلـ زـوـاـيـاـ التـشـرـدـ وـ التـكـثـمـ .

أنا طفل أريد أن ألعب
أنا طفل أريد رفيقي

أريد مدرستي .. حبيبتي و حداقي و العابي

أنا طفل من حقي أن أكون حراً

من حقي أن أكون طفلاً

من حقي أن أرى أن وطني بلا دماء وبلا رائحة الموت.

نعلم جميعاً بأن اللعب من أهم مكونات الشخصية عند الطفل ويتوقف نمو شخصيته على كيفية بناء علاقته مع أصدقائه و من حوله في المجتمع ، حيث يشعر من خلال اللعب بالفرح، ويتعلم قواعد وأصول التعامل مع الآخرين، وتعزيز روح المشاركة لديه، من خلال اللعب ، أما أطفالنا في الثلاث سنوات الأخيرة، فقد عانوا كثيراً من هذه الناحية، حيث عدم القدرة على اللعب مع الأصدقاء خارج المنزل لعدم وجود الأمان في الوطن، ولهذا أسبابه، وتأثيراته الكثيرة على شخصيته ومن أبرز هذه التأثيرات تزايد نسبة القلق والتوتر لديه، إذ يتكمّل الطفل في منزله رغمـ عنهـ، كما أنه محروم من الكثير من احتياجاته في عصر التكنولوجيا كمشاهدة فيلم كرتوني على التلفاز و اللعب على الكمبيوتر، بسبب عدم توافر الكهرباء بالشكل الكافي، إذ لا تصل مدة وجود الكهرباء إلى ساعة يومياً، في أفضل المناطق، مسرح الأزمة، إن الخوف وعدم الشعور بالأمان يمنعان الطفل من اللعب في الحدائق العامة، وهذه المكشلة يعني منها معظم أطفالنا في الداخل السوري، أما بالنسبة للطفل السوري في المهاجر، ومناطق اللجوء، فهو أمام جيران جدد، لغة جديدة، تعامل آخر، تربية أخرى بالإضافة إلى عدم الشعور بالأمان معهم ، ويبقى الطفل المهاجر وحده منعزلاً، حائراً، قابعاً، في زوايا بيته، أو خيمته، و مأواه الوحيد، ليس لديه سواهـماـ ، و لـعـبةـ مـكـوـنـةـ منـ عـصـاـ، أوـ كـرـةـ منـ خـرقـ، أوـ لـوـادـنـ، عـثـرـعـلـيـهـاـ فيـ الطـرـقـاتـ عـلـىـ الـأـلـغـلـبـ، وـهـوـمـدـرـومـ منـ مـتـابـعـةـ التـعـلـيمـ فـيـ مـدـرـسـتـهـ، فـأـيـ حـيـاةـ طـفـولـةـ يـعـيشـهـاـ أـطـفـالـنـاـ فـيـ الـخـارـجـ؟ـ، وـ فـيـ الدـاخـلـ؟ـ، وـ مـنـ يـحـسـدـ هـكـذاـ طـفـلـاـ عـلـىـ هـذـهـ الطـفـولـةـ التـيـ يـعـيشـهـاـ؟ـ، وـ مـنـ يـسـاعـدـهـ لـيـعـودـ إـلـىـ شـارـعـهـ لـلـعـبـ، إـلـىـ بـيـتـهـ؟ـ، وـ إـلـىـ رـفـاقـهـ، وـ أـهـلـهـ؟ـ، وـ مـدـرـسـتـهـ؟ـ، وـ أـيـ قـلـبـ يـشـعـرـ بـمـاـ يـشـعـرـ بـهـ هـذـاـ طـفـلـ مـنـ أـلـمـ وـ غـرـبـةـ وـ حـرـمانـ؟ـ .

كل حياته، برد في الشتاء القارس، وحر جحيمي في الصيف الملتهب،.. و ألم .. كبرباء .. و وجع و نقص في الثقة بالذات ، فأية "طابة" كان يحلم بها الطفل؟، و أية ذمية كانت تحلم بها شقيقته الطفلة، و أي طريق يسلكـانـهاـ؟ـ، و أي عمر يمضي في المركب المحطم الذي يمضـيـ بـهـمـاـ، وـأـيـ حـظـ محـطـمـ هوـ حـظـ مـثـلـ هـذـيـنـ الطـفـلـيـنـ اللـذـيـنـ لمـ تـتـرـكـ لأـجلـمـاـ منـظـمـاتـ الطـفـولـةـ العالميةـ، بما يـكـفـلـ إـيقـافـ دـورـةـ الحـربـ.


هـذـاـ هوـحالـ الطـفـلـ السـوـريـ، أوـ الطـفـلـةـ السـوـرـيـةـ، طـفـلـ فيـ منـتهـيـ الـبـراءـةـ، طـفـلـ عـاـشـ الثـورـةـ، وـصـارـ الشـاهـدـ عـلـىـ العـنـفـ بـأـنـوـاعـهـ، مـنـ بـدـايـاتـهـاـ، فـتـدـرـجـ بـيـنـ الـبـؤـسـ وـالـشـقـاءـ، ليـكـونـ



تأثير الهجرة على العنوسه لدى الفتاة في المناطق الكردية

لقد ابتليت المرأة الكردية بجملة العادات والتقاليد البالية والقيم المختلفة كبحث من خلالها حرية المرأة بمظاهر حمراء وأحكام صارمة متنوعة أدت إلى شلل حركة المرأة في محياطها الاجتماعي ووضع القيود على حريتها وفعاليتها الإنسانية في الحياة ومنعها من أخذ دورها الطبيعي في المجالات المختلفة، فالمرأة حسب جملة العادات والتقاليد السائدة هي العوراء وهي الشرف وهي مكمّن الضعف والعيوب وغيرها من العادات التي أضحت بحقوق المرأة...

ونتيجة هذه القيود وأمور عديدة أخرى وخاصة الممارسات العدوانية



التي مارستها الأنظمة الدكتاتورية بحق الشعب الكردي على مختلف الصعد جعلت المرأة مختلفة عن قريباتها في الدول المتقدمة.

وباعتبارها العرض والشرف في المجتمع الشرقي فهي تتعرض للكثير من القيود والرقابة فهناك خطوط حمراء لا يجب أن تتجاوزها لكي تصون نفسها من أحكام المجتمع لا يرحم فحتى في الزواج هناك قيود وشروط تفرض عليها حيث يتحايل الشباب الزوج متى أرادوا ذلك ولا يشكل المظهر أو العمر أي مشكلة لديهم أما بالنسبة للفتاة فليس عليها سوى الانتظار وكلما تقدم بها العمر يزداد قلقها من العنوسه

ظاهرة العنوسه أو التأخر في سن الزواج قد تحولت إلى مشكلة حقيقية تعصف بالفتاة الكوردية وتهدد مستقبلاها في ظل هذه الأوضاع الراهنة وذلك بسبب العجرة التي طالت المناطق الكوردية وخاصة هجرة الشباب وبقاء النساء والأطفال، حيث غادر معظم الشباب من غربى كردستان أما للعمل أو هروبها من الظروف الأمنية السيئة الأمر الذي أحدث فجوة كبيرة في بنية المجتمع من حيث العدد بين الجنسين فأصبح عدد الفتيات ما يقارب ضعف عدد الشباب وهذا الإشكالية سيطر بمستقبل الفتاة وحرمانها من أهم حقوقها التي تكمن في الزواج والأمومة.

وعندما أخذنا أراء بعض الفتيات بشأن هذا الموضوع قالت شيرين 27 عاما "يزداد قلقنا من العنوسه عبر الأوضاع الحالية حيث زادت الهجرة من مخاوفنا أكثر فنحن على عكس الشباب تتأثر بالعمر والمظهر الخارجي قد يفوتنا قطار العمر دون أن نلتقي بمن نتزوجه وننعم بالاستقرار".

أفيني 31 سنة تقول " في روح آفا نحن ندفع ضريبة الهجرة حتى إذا تزوج أحد الشباب من منطقتنا وهو في المهرج سيكون غالباً من فتاة أجنبية بغية الحصول على جنسية البلد الذي التجأ إليه "

ومن جهة أخرى فإن للعنوسه تأثير نفسي بالغ على الفتاة فهي تشعر بأن لديها عيب أو نقص فالمجتمع غالباً ما ينظر إليها بنظرة إشراق أو تلقى أحياناً كلام جارح بسبب عنوساتها، خانم ذات 40 سنة تقول " أنا كثيراً ما أ تعرض للضغط في الذهاب إلى المناسبات الاجتماعية لأنني بالرغم من تقبل واقعي كعائسه إلا أن هناك من يصعب على الأمر دائمًا فكثيراً ما أسمع كلاماً جارحاً وخاصة من بعض النساء التقليديات أو حتى من بعض الشابات اللواتي يعيرون عنوستي وعدم زواجهي "

تبقى الحاجة ملحة إلى حملات توعية بالتنسيق مع منظمات المجتمع المدني والمؤسسات الاجتماعية النسوية من أجل الوقوف على هذه المشكلة ودرء مخاطرها ومدى تأثيرها على الفتيات والعوائل بشكل عام لتخفيف نظرة المجتمع لظاهرة العنوسه وعدم اعتبارها عيب أو نقراً لفتاة والعمل على تقبل الفتيات اللواتي كبرن في العمر لظاهرة العنوسه لديهم والتخفيف من تأثيرها النفسي عليهم.

نوفين مرعي ..رميلان ..

حكاية عودة ..

إلى بوابة العبور إلى الوطن، طوابير من الناس تنتظر دورها في التسجيل على الجانب التركي لتفادر نحو الجانب السوري ..
عبر الدرباسية من الجانب التركي حاملاً حقاتي فرحاً بالعودة، سكة القطار وجند الحدود والموظفي التركي يقرأ اسماء العائدين. امرأة لا تخلى عن مناق امها وختمت العناق أخيراً بكاء الرحيل وقبلة من اليدين مع ملامسة قدمي لأرض الوطن تساقطت قطرات من المطر لتفوح رائحة التراب تلك الرائحة المصنفة من المسك .

هنا سوريا أو غرب كردستان كما تحلو لي تسميتها، دخلت الدرباسية وأول مشهد مفرح رأيته هو حاجز للقوات الكردية نعم لأول مرة منذ أن ولدت أولى حاجزاً للشرطة افراده من الكُرد وهجتهم كُردية، اجتازت الحاجز بعبارة (سباس هفال) شكرأً رفيق.

وصلت عاموداً والليل قد فرش أجنته. ومن حسن حظي لم تكن الكهرباء منقطعة، فإذا تلست النظر من خلف نافذة السيارة آلى شوارع عاموداً ومحلاتها المرصوصة والمتقابلة على خطين متوازيين حتى نهاية المدينة، حتى الخروج منها متوجهها صوب قامشلو.

نعم قامشلو.. أشم راحتها النقية من بعيد، واحبها من قريب وبعيد.. أقل من نصف ساعة في الطريق مارأ بعدة حاجز للاسياش وصلت إلى قامشلو من مدخلها الغربي من هي الهلالية من فوق تلك القمة التي تظهر لك الكثير من بيوت المدينة المتخصبة بين طيات الظلام المفروض عليها. الشوارع كانت خالية والهدوء يعم الأحياء، وكان يؤلمني تكرار عبارة الدار برسم البيع، إنهم يبيعون بيوتهم ويهاجرون خشية من الموت جوعاً وفقراً مع ازدياد الحصار عليها في كل يوم من قبل الجماعات التكفيرية.

إلا أنها تبقى قامشلو. مدينة الحب، مدينة العشق والسلام، مدينة التعاليش والصمود. و إلى أن وصلت عتبة منزلنا كدت اختنق من شدة ابتلاعها لهوانها الذي يعيده لك الروح ويدخل الدفء إلى عظامك العše من آخر وبعد. واصبعت أنفي من استنشاق تربتها وأرضها الفاضلة. وبالرغم من الهجرة والرحيل وبالرغم من المصائب التي حلّت وتحل على قامشلو وسكانها تبقى هي المدينة الأولى في حياتي بدون منازع .

سردار احمد





Vitamin A .

Vitamin A



Navê kîmîkî (zanistî)w
Rêtînol yan Bêta karotîn yan
rêtînoîdat .
Çav kaniyên Vît. A.
Donê masî ,Kezeba reş ,
Hêk, Mast , şîr, penîr ,Pelên kesk
u şînî ,
Gêzer u kündir .

Sûdeyên vît. A.
Xûrt kirin u dijwar kirina awira
çavên mirov.
Afirandina hestî dinan u çermê
laşê mirov .

Arîkare ji bo şînbun u afirandina
şaneyên laşê mirov.
Kêmbûna vit .A. di laşê mirov

de.bi bê sedema :
Gelek problêm çavan (Bi taybeti
korbûna bi şevan , kurd ji vê
neweşiyêre dibêjin (şev reşkî
bûye ,ev tê wateya kû kesê
şevreşkî di şevê de nabîne ,lê di
rojêde normale),her wiha
ziwabûna çavan, problêmên
çermê laşê mirov .zikêş.
Zêdebûna Vît. A. di laşê mirov de
, di bê sedema nexweşiyê
kezeba reş .
Pêdivîya rojane bi vît. A .
ji bo jinan 700 mîkro gram.
ji bo jinê avis 770 mîkro gram.
ji bo mîran 900 mîkro giram .

Hêvî

Di kolanên Xemgîniyê de, Çavêن matmayî pirsên xwe peypez
dikin. Êdî Stêr hişyar dibil û hin Berçemokêñ westiyayî li ser
keviya hilmê Stranêñ tariyê dibêjin.

Şev jî bi heman şêwezarê xwe şîretêñ dilovaniya xwe bi Evîndar
aran re parve dike.

Heyv di tirsa xwe de maye û serê xwe hişk kiriye. Ahîna Şevê
bilind dibe û Neviyên Şevreşkê Şevê hêj ji bin Tûmikêñ
bêdeng amadekariya planêñ xwe dikin...

Êdî Pertûk jî pirsa gotinêñ perişan ji min dike, ez jî bi Pênuşa
xwe re gazî Bîreweriyê dikim...

Hêvî ci qas tu mijûl bî were,
Serma ye, Zivistan e, were...

Xewgiranî, ne Can ji Hêviyê diweste... Ne dil ji hêviya Hêviyê
diweste...

Ü Ne ez û ne Pênuşa ji nerîna Çavêñ Şevê diwestin...

O

ŞEKROKÊ LI SER GORISTANÊ,
SILAVÊ LI PAKREWAN BIKE...

DENGÊ TEQÎNÊ HAT...

ZAROK Jî,
BÛN ŞEKROKÊ PEQÎNÊ...

X

JI NÛ VE TÊ ÇAWA XWE AVA BIKE?

HESTİYÊN TE LI SER SÎNORÊN METIRSIYÊ
BELAVBÛYÎ NE...

I



ÇI DI BUXÇIKA TE DE YE?

TU DÊ KENÊ ZAROKAN JÎ KOÇBER BIKÎ?

R

XWE JI BER MIN NEVEŞÊRE! XEWNA MIN
HÊJ BI PAŞEROJÊ VE MIJÛL E...

A

MEŞİYAM...

PÊLAVA MIN DI HERIYA WELAT DE
ENGİRÎ...

REVIYAM...

ÇAVÊN PÊYÊN MIN LI PAŞ MAN...

D

I

ŞÎRÊ TE NE ÇEPEL BÛ!

LÊ BEXTÊ MIN KELÊ YE...

L

DI PAŞILA XATIRXWESTINÊ DE
BILÛRA KESERÊ LÊVÊN POŞMANIYÊ
DIPELÎNE...

Ezîz XEMCIVÎN

ÇI QAS XWÎNA XWE ŞÊRÎN BIKIM!

KULÎLKÊN DÊMÊN TE NEMA BI KENÊ MIN Î
DEHBE DIXAPIN...



Dîkê Kor

hebû tune bû rehme li dê û bavê min û we bû
 li gundekî ji gundan..hebû pîrek du diran
 dilê pîrê çû meyrê..û li xwe nekete heyrê
 li bin kulînê dest peland..çenget dan ji bin kişand
 pîrê rahişt danê xwe..û çû ba destarê xwe
 nêzîkî destarê wê..kom bibû gemara wê
 li ser gemarê wê dît..dîkê ku bi gemarê dilîst
 bi nikil û neperûşkan..dîko û çend mirîşkan
 vedxepirandin gemar..li ber wê pîra xityar
 pîra me ya pir xityar..danê xwe xiste destar
 libek ji danê pîrê..pekiya nêzîkî bîrê
 pîrê ji cihê xwe çeng bû..li dû liba dan ve çû
 dîk êrîş kir liba dan..niklê xwe lêxist , daqurtand
 pîrê şûnka xwe avêt..û çavê wî dîk rijand
 ava çavê dîk hat xwar..dîk kire qêrîn û hawar:
 eman zeman:ezê herim bînim leşkerkî giran
 ser pîra du diran..çavê min rijand bo libek dan
 rojêñ wî derbasbûn..çi li deşt , çi li zozan..
 çi buhar û çi havîn..çi payiz û zivistan
 tûpişkekî ew ï dît û bankir : wa dîko
 dîk vegerand :quzzel qwert û pazde fîko
 got: ma ji tere bêjim çi lo..got: ji min re bêje dîkilaxa
 got: wa dîkilaxa..got: hêgot: tu bi kû ve diçe lo
 got: eman zeman..ezê herim bînim leşkerkî giran
 ser pîra du diran..çavê min rijand bo libek dan
 tûpişk got:ma tu min bi xwe re nake heval?
 dîk got : çîma na..tûpişk da dû dîk û bihevre gav radan
 pêrgî marekî reş bûn..mare reş got:
 ma hûn min bi xwe re nakin heval
 dîk got : çîma na
 marê reş da dû dîk û tûpişk û bihev re gav radan
 pêrgî tepikek rêxa dewaran bûn
 tepkê ew dîtin û bankir û got:
 ma hûn min bi xwe re nakin heval
 dîk got : çîma na
 tepkê da dû dîk û tûpişk û marê reş
 û bihevre gav radan
 pêrgî gundorekî bûn
 gundor ew dîtin..lê guh neda wan
 dîk bankir:wa gundoro
 gundoro got:Dîkê dike qore qor berî rok here jor
 Tu çi digere li aliyê axayê xwe gundor



diko got: eman zeman
 ez hatim ji bo leşkerê giran
 bibim ser pîra dudiran..çavê min rijand bo libek dan
 gundor got:ev ên bi te re kîne? û çi dixwazin?
 dîko got: ez qurban tu ji min re leşkerê giran
 ev ji bo te alîkar i û heval in
 gundor pozê xwe Hilda û got
 ez im leşkerê giran..ez ê tune bikim pîra du diran
 ez naxwazim heval û alîkaran
 dîk nêzîkî gundor bû û di guhê gundorde got:
 tu leşkerê giran e..lê tu nikare biçe ser kaş
 tê vegere pişt û paş
 Tê gaziyê bixwaze ji hevalan
 Gundor rawestiya û bidengekî nazik di guhê dîk de
 got:
 Ez im leşkerê giran..bera gotinê te negihêñ hevalan
 lê ez bi te re naçim ser pîra dudiran
 berî tu bicî bîne du peymanan

Dîk got: ka bêje ez qurban
 Gundor got:divê tu tepikê bîne
 û min li ser deyne
 tê bi hevalên xwe re bikşîne
 ez bi gindirandinê narim delal
 ez nikarim bi kaş û newal
 gundor hildan ser tepkê
 piştâ tepkê hate xwar

li aliyekî tûpişk bû..li aliyê dî maye mar
 hersiya rahiştin gundor..dîkê me kir qore qor
 li pêşîya wan bi lez çû..ewêñ mayî dane dû
 ta gihan mala pîrê..av vexwarin ji bîrê
 bîhna xwe frekirin..her çara xwe bi cîkirin
 tûpişk ket nav doşekê..tepkê ket nav tifikkê
 mar ma li erda xanî..gundor çû serê banî
 gava dunya bû êvar..ji bakur hate bayê sar
 pîrê ji gerê vegeriya..ji serma li tinê gerya
 pîrê tifika xwe dada..tepkê tifikk nedada
 di nav livînan de xwe rada..li wî tûpişkî pê veda
 çeng bû ta bike hewar..pê veda bû ew reş mar
 derket devê deriyê xwe..por kişandî ji serê xwe
 kire qêrîn û kire hewar..gundor ji jor hate xwar
 sere pîrê wî şîkand..hestiyê pîrê perçiqand
 bû qebhet û bû ibret..bo merovêñ bê rûmet


Ji kervetorêñ Kurdi
 Berhevkar: Dr. Hejar Şîkakî

Serjêr

- 1-cihi - tersê girî.
- 2- pêwistî - ji navêن keçan.
- 3- ji navêن kuran - rîbaz.
- 4- nîşan û xwestek.
- 5- ben - tersê belê.
- 6- tersê ko - find û fener.
- 7- pî - birayê bav(B) .
- 8- komarek İslâmî ye ji koka Arî ye yek ji rengan.

Rast

- 1- navê vê kovarê-hejmara piştî 29.
- 2- çiyayê Cûdî.
- 3- gotinek ji van tîpan pêk tê (r,m,v,k)- sê tîp ji gotina Amûşî.
- 4- du tîp wek hevin- tersê mîr.
- 5- çar tîp wek hevin.
- 6- tersê jite- qizêz.
- 7- tersê na- sê tîp ji gotina tûpişkî
- 8- tersê bizin- tersê çûn.



Pend û Şîretên pêşıya

- 1 – vîn hespa azadiyê ye .
- 2 – em di rûnê xwe de sor dibin .
- 3 – diz nakevin mala tazî û rût .
- 4 – piştî banê, ga bi cil kirin .
- 5 – temenê segê har cil roj e .

Ferhengok

Asan	سلس
Bînger	شاشة
Xweyî	شخصي
Qûç	هرم
Bidbûn	إعجاب
Rûdaw	واقع
Jindar	متزوج
Mêrdar	متزوجة
Şobendî	زوج
Şoman	زوجة
Şoyer	زوج

Peyva wendayî ji 10 tîpa ye , navê hunermendekî Kurd e ji Qamişlo ye ji sitranêن wî (Kerwan)

L	A	V	A	S	O	R	X	A	N
X	A	L	R	Û	K	E	N	Ş	N
W	X	E	L	A	V	P	E	R	Î
W	E	L	A	T	E	F	R	Î	N
S	E	R	Ê	K	A	N	I	Y	Ê
T	K	Î	S	Î	P	E	L	V	M
Ş	I	L	Ê	R	A	L	A	L	Û
E	N	A	Ş	E	H	N	A	Z	M
H	O	G	I	R	Ş	Ê	R	O	L
Q	A	M	I	Ş	L	O	E	Z	O

Efrîn	Xan	Lav	Lava	Perî
Rûken	Kî	Serê kanî	Welat	
Şehnaz	Şêro	Lal	Sor	
Hogir	Qamişlo	Şilêr	Tu	
Şipel	Ez	Mûm	Xal	





Dêrika Hemko

ولات (ثقافية . عامة . مستقلة) . نصف شهرية

welat.press@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

العدد ١٧٨ شباط ٢٠١٤